Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : *** Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
*** Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
*** Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de .**

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê - YEKÎTÎ*
Email : **Newroz95@hotmail.com**

Hejmar(73) Nîsan 2007 z-2619 k Buha (15) p.s

Serfirazî û pêşketin Ji kar û barê we re

Rêz û silav ji beşdaran re.
Ji mîvanên birêz , heval û hogrên hêja û ji birêvebiriya konferansê re .

Ji Sûriyê , silavên biratî û hevltiyê ji we hemiyan re hene , bihêviya ku lidarxistina vê konferansê li ser riya xebata dadmend ya gelê me yê kurd li sûriyê bi gaveke erênî û serkeftî be , di xizmet nûjenkirin û danheva kurdên li xerîbiyê de be , di çarçewa rêzagirtina destûr û qanûnên welatên Ewropaî de be .

Birayên hêja , hevalên xebatkar!

Li Sûriyê , ji ber rewşa awarte , di siha siyaset û desthilatiya tekpartî de , di siha tevdîr û pirojeyên şoven , girtina Keyfî û bêparhêştina gelê me ji hemî mafên wî yên netewî , nemaze mafê bikaranîna zimanê dê , di siha binpêkirina mafên mirovan , çi kurd çi ereb … hwd de , ji xebat û liberxwedanê pê ve , tu rê li ber me nîne .Lewre , parta yekîtî ya demokirat a kurd weke birekî girîng û bingehîn ji tevgera kurd li hundir welêt , di xebata xwe de berdewam e û her dê bidome û bi xêra siyaseta xwe ya hişmend û pîvayî , parta we bi rûyekî sipî ciyê xwe di nav gel de , li seranserî herêmên kurdî û gelek bajarên sûrî yên mezin girtiye û berfirehtir dibe . Loma jî , erk û stobarên me jî mestir dibin , nemaze di warên lêxwedîderketina li zimanê dê , parastin û nûjenkirina hevbendiya demokrat a kurd li sûriyê û mil li mil li gel Berê demodemoqrat a kurd , bona danheva tevgera kurd li welêt bi hêla pêkanîna lidarxistina kongrekî kurdî li Sûriyê .

Li hêla dî bêguman , rol û endametiya parta we li gel partiyên dî ên Ber û Hevbendiyê di piletforma danezanîna şamê – îlan Dîmeşq – de , roj bi roj cîgehê rêzgitin û egera qelaştina rê li ber danasîna dadmendiya pirsa kurd li Sûriyê û geşkirina çanda mafên mirovan , demokrasî , wekhevî , tazîkirin û rûreşkirina nijadperestî û sîstema tekpartiyê li Sûriyê .

R(13)